Atîna, 19 Cotmehê 2020

# DAXUYANİYA ÇAPEMENİYÊ

## Platforma înternetê a Daîra Penaberiyê tê xurtkirin– Kar û barê Daîra Penaberiyê tenê bi rêya înternetê randevû tên dayîn

Wezareta Koçberiyê û Penaberiyê b xizmetên nu platforma înternetê xurttir dike (applications.migration.gov.gr). Ji sibê roja Sêşemî 20.10.2020, derfet ji bo serlêderên mafê penaberiyê tê dayîn ku randevûya xwe bi rêya înternetê werbigrin û tê diyarkirin ku Daîra Mafê Penaberiyê **ji vir û pêda tenê kesên bi rêya înternetê randevû werbigrin qebûl dike**.

Heta vê gavê kar û barên ku bi înternetê dihatin kirin ev bûn:

- Hevpeyvînên hatine plankirin
- Tomar-Qeydên hatine plankirin
- Dayîna belgên-weraqên ku têkildarî doza gihîştina malbatê (dozên Dûblînê)

Wek îstîsna, ji ber sebebên kêm wextê, daxwaza îstinafê bê randevû tê qebûlkirin.

Ji Hezîrana 2020 da, bê ku kes rû bi rû amadebin, gelek karên din bi rêya înternetê tên kirin, wek:

- Guhertina agahiyên têkildariyê
- Guhertina agahiyên nasnamê
- Daxwaznameya bişûnvexistin/ bi pêşvexistina hevpeyvînê
- Belgeya statûya serlêdanê
- Belgeya ji hev qetandina dosyeyan
- Belgeya dayîna ewraqan

- Belgeya dayîna fotokopiyan-suretan
- Daxwaza alîkariya hiquqî
- Lêgerîna hêjmara tenduristiyê (ΠΑΑΥΠΑ)

Û dîsa ji bo ku  zêde kes li daîrên penaberiyê kom nebin, wexta  bidawîbûna qertên serlêdana mafê penaberiyê (belga sê pelî) li gorî hêjmara dawîn a hêjmara melef-doza wan  ji 2 Mijdarê 2020 an heta 14 Çile 2021 an hatine dirêjkirin.